Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1192 | 4-Tebax-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Armanc fêrkirina çand û exlaqê Kurdewarî ye’

**Navenda Nûçeyan**

Mamoste û xwendevanên Akademiya Şehîd Serhed bilêv kirin ku armanca wan fêrkirina çand û exlaqê Kurdewarî ye û bang li tevahî gelê Kurd û bi taybet li ciwanan kirin ku xwedî li çand û hunera Kurdewarî derkevin.

Akademiyek li ser navê Şehîd Serhed di 1’ê Hezîrana îsal de li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) hatiye vekirin. Di vê akademiyê de dewreyek ya perwerdeya enstrumanan li ser navê Şehîd Devrim hatiye despêkirin. Mamoste û Xwendevanên vê dewreyê têkildarî perwerdeya xwe ji ANF’ê re axivîn û banga xwedî derketina li çand û hunera Kurdewarî li gelê Kurd kirin.

Mamosteya Gîtarê Helena Hilalî diyar kir ku wan li Akademiya Şehîd Serhed a ku 1’ê Hezîranê hatiye vekirin, dewreyek li ser navê Şehîd Devrim daye destpêkirin û wiha peyîvî: “Xwendevanên ku di vê Akademiyê de waneyê dibînin, par li Navenda Stêra Zêrîn bingehê fêrbûna enstrumanan ava kirine. Me di vê Akademiya Şehîd Serhed a bi dewreya Şehîd Devrim vekirî de, êdî bi awayê profesiyonel perwerde daye destpêkirin. Di biniya vê Akademiyê de gelek projeyên me hene, wek şano, govend, stiran û hwd. Perwerdeya ku li vêderê tê



dayîn, ne wek qursekî 3-4 mehî ye, wê bi awayekî berdewam bên dayîn.”

**‘Mereqa zarokên wargehê ji bo çandê heye’**

Helena di dawiya axaftinên xwe de bi bîr xist ku waneyên ew li vêderê didin ji asta yekem hîn berfirehtire û wiha dibêje: “Hêjmara xwendevanên me bi du koman girtiye dest, ji ber ku xwendevanên koma duyem temenê wan biçûke û fêrkirina wan hinekî zehmete. Her yek ji wan koman heftiyê sê rojan tên dersê. Lê herçendî ku pir germe jî lê mereqa zarokên wargehê ji bo çandê heye. Li vê derê armanca me ne tenê fêrkirina enstrumanane, fêrkirina çand û exlaqê Kurdewarî ye ku bav, dayîk û kalên me heta roja îro anîn, parastin û domandin. Her wiha em di aliyê îdeolojî de jî xwendevanên xwe rêxistin dikin. Eger em nexwazin qirkirina çandî bi ser me de bê, divê em di aliyê fêrbûna enstrumanan û pêşxistina çandê de berxwedanek mezin bikin. Li pêşiya me 15’ê Tebaxê heye em ê hewl bidin komek a enstrumanan amade bikin ji bo dikê.”

**Armanc sîstema orkestra dayîna avakirine**

Her wiha mamostayê Tembûrê Cemal Hemkî jî têkildarî waneya Sazê ya ku di dewreya Şehîd Devrim de dide, axivî û got: “Ez perwerdeya Sazê didim 38 xwendevanan, hinek xwendevan hene nû fêr dibin û hinek jî astek wan a fêrbûnê heye. Armanca me ew e ku em wan bigihîn astekî wisa ku bikaribin di dema pêş de perwerde bidin. Di biniya akademiyê de perwerdeya Saz, Rîtîm û Gîtar heye. Yek ji armanca me ya sereke ew e ku em li vêderê sîstemekê wek orkestra bidin meşandin. Perwerdeya sazê xwedî sê koman e, koma yekem ji demjimêr 17:00 heta 18:00’ê ye. Piştî ku ev demjimêr temam bû, şeş kes asta wan hîn jortire em wana di asta pisportî de fêr dikin. Her wiha koma duyem jî perwerdeya wan rojek heye û rojek nîne, rojên ku perwerdeya wan heyî jî di demjimêr 18:00 heta 19:00’e.”

Cemal Hemkî di dawiya axaftinên xwe de ev bang kir: “Weke mamostayek ê Akademiya Şehîd Serhed banga min ew e ku hemû ciwanên Kurd li çand, ziman, urf û adetên xwe yên civakî xwedî derbikevin”

**‘Hîn zêdetir xwe pêş bixin’**

Xwendevana bi navê Dûygû Benek ku waneya gîtarê dibîne jî wiha behsa perwerdeya xwe dike: “Hezkirina min a ji bo gîtarê cara yekem li Navenda Stêra Zêrîn çêbû. Me li Navenda Stêra Zêrîn sê mehan perwerde dît, piştî ku perwerdeya me qediya merasîma derçûnê ji me re hat çêkirin. Her wiha piştî wê, Akademiya Şehîd Serhed hat vekirin li vêderê ez waneya Gîtarê dibînim. Banga min ji bo hemû ciwanên wargehê ew e ku hem li Navenda Stêra Zêrîn û hem jî li Akademiya Şehîd Serhed dest bi perwerdeyê bikin.”

**‘Ji bo min wekî terpiyekê ye’**

Herî dawî xwendevana bi navê Xurbet Arzû ku waneya Sazê dibîne, wiha qala heskirina xwe ya ji bo Sazê dike: “Dema ez biçûk bavê min saz lêdixist, ji min re jî sazek biçûk anî û min jî li gel wî lêdixist ji ber wê heskirina min di temenek biçûk de ji bo sazê çêbû. Bavê min ez teşwîqê lêxistina sazê kirim, ji bo wê jî min xwest li ser şopa bavê xwe biçim. Ev du salin ez xwe fêrî sazê dikim, sala destpêkê min di beşa meşq (egzersız) de cih girt, sala din ez derbasî lêxistina muzîkê bûm. Îsal li dibistana Amadeyî ya Şehîd Koçerîn jî me li gel mamostayên xwe yên dibistanê weke koroyekê ji bo 4’ê Nîsanê amadekarî kir û em derketin ser dikê. Min ne xwest dest ji Sazê berdim, ji bo wê ez derbasî Akademiya Şehîd Serhed bûm. Ez gelek kêfxweşim ku hatime akademiyê, lêxistina sazê ji bo min wekî terpiyekê ye ji ber wê ez naxwazim dest ji sazê berdim. Li vêderê hem çand û hunera Kurdî tine nabe û hem jî ez xeyalê malbata xwe pêk tînim. Li wargehê ruxmê ambargoya heyî fêrbûna Saz, Gîtar, Erbane û hwd şansekî herî mezine. Banga min ji bo hemû zarokên Kurd ew e ku ji bo çanda Kurdewarî tune nebe xwe fêrî çand û hunerê bikin.”

# Kombûna Şanoya Zenûbiya bi israr e Reqayê bike bajarê hunerê



**Li Reqa jinên ciwan bi avakirina Kombûna Şanoya Zenûbiya re, têkoşîn jiyana jinan derdixin ser dike, hedefa wan ewe ku di mijarên jinan de hişyariyê bidin, di heman demê de kombûn bi israr e Reqayê bike bajarê hunerê.**

Li bajarê Reqa yê Bakûr û Rojhilatê Sûriye jinên ciwan bi avakirina Kombûna Şanoya Zenûbiya, armanc dikin şanoyê li bajar pêşbixin û hê zêdetir jin beşdarî hunerê bikin. Kombûn di heman demê de bi lîstokên derdikevin ser dikê, weke çawa ku li hemberî pirsgirêkên jinan hestiyarî ava kirî, rastiya jinan, serkeftinê wan, têkoşîn û dîroka wê derdixin ser dike û hafizaya dîtbarî ava dike. Kombûn ji 8 jinên ciwan ên ku temenê wan di navbera 15-18 salî de pêk tê. Endamên kombûnê derbarê xebatên ku didin meşandin de û armancê wê axivîn.

Endama kombûnê Semer Cumaa derbarê kar û xebatên xwe de wiha got: “Me ciwan hilbijartin ji bo di tîmê de kar bikin, ji ber ev tîm dikare hunerê bi awayê rast bighîne. Em beşdarî gelek çalakiya bûne û di wan çalakiyan de bi lîstikên se rpirsgirêkên jinan me hişyarî belav dikir. Di bingeh de em mijarên derbarê jinan de digrin dest, ji derveyî em rastiya urf û adetên ku jin di demên DAIŞ’ê rû bi rû mane derdixin holê, jind di nava civakê de çawa jiyan dikin, bi deman role wan ya statu tê vegotin, pirjinî jî di nav de em pirsgirêkên ku di roja îro de jiyan dkirin derdixin ser dike. Zewicandina zarokên biçûk, mijarên ku avakirina çareseriya li dijî tundiya fîzîkî û psîkolojîk digrin dest.”

**‘Netewa demokratîk di zindîkirina hunerê de giring e’**

Endama kombûnê Israa El-Ebûd diyarkir ku hezkirina min ya ji lîstikvaniyê re bû sedem ku beşdarî kombûnê bibim û wiha got: “Lîstikvanî ne tiştek hesane. Lê bi perwerdeyê re em dikarin hemû tevger û diyalogan fêr bibin, ji ber wê divê lîstikvan rola xwe baş bilîze. Rolên ku ez dilîzim rastiya jinan li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê derdixim. Rolek gelek giring ya pirojeya Neteweya Demokratîk di zindîkirina hunerê de heye. Banga min ji bo hemû jinên ciwan ewe ku her jina ciwan ku kêrhatiya wê di hunerê de heye beşdarî hunerê bibin.

**Ciwan eleqeyek zêde nîşanî hunerê didin**

Endama kombûnê Nexem Xelîl ev tişt got: “Piştî bavê min kêrhatiya min a şanoyê nas kir ez teşwîqî beşdariya koma şanoyê ya navenda Hîlala Zêrîn kirim.”

Hûr El-Ebid îfade kir ku di koma “Palmêra” ya hunera gelêrî de cih digre û amûra Kemanê lê dixe û wiha got: “Bi beşdariya koma şanoyê, ez kêrhatiyên xwe yên kesayetî pêş dixim. Di kêliya ku ez derketim ser dikê hestên tirsê stres û kêfxweşiyê bi min re çêbû, wê kêliyê min dest bi pêkanîna xeyalên xwe kiribû.” **NÛ JINHA**

Sudoku: Bersiv 98

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 1 | 4 | 2 | 6 | 8 | 3 | 5 | 7 |
| 5 | 6 | 8 | 7 | 3 | 1 | 4 | 2 | 9 |
| 7 | 2 | 3 | 4 | 9 | 5 | 6 | 8 | 1 |
| 3 | 7 | 1 | 9 | 5 | 6 | 8 | 4 | 2 |
| 8 | 5 | 2 | 3 | 4 | 7 | 9 | 1 | 6 |
| 4 | 9 | 6 | 1 | 8 | 2 | 7 | 3 | 5 |
| 6 | 4 | 9 | 5 | 1 | 3 | 2 | 7 | 8 |
| 1 | 8 | 7 | 6 | 2 | 4 | 5 | 9 | 3 |
| 2 | 3 | 5 | 8 | 7 | 9 | 1 | 6 | 4 |

Sudoku:Pirs 99

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 5 | | | 2 | | | |
| | 3 | | | | | 7 | | |
| 2 | | | 1 | | 5 | | 3 | |
| 6 | | 7 | | 9 | | | 2 | 3 |
| 5 | | 4 | | 2 | | 8 | | 6 |
| 9 | 2 | | | 8 | | 1 | | 5 |
| | 9 | | 8 | | 3 | | | 7 |
| | | 8 | | | | | 6 | |
| | | | 4 | | | 3 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Li ber avê berda:**
- Bi heman wateyê.

**Keda wî di avê de çû:**
- Bi heman wateyê.

**Malê xwe di avê de berda:**
- Bi heman wateyê.

**Ava nerm e/ava nerme ye:**
- Ne weke dîtina xwe ye; baş xuya dike lê xirab e.

**Pehîna kerê kulek e:**
- Lewaz xuya dike lê derbên wî dijwar in.

**Qalibê mêşa ye, dengê şeşa ye:**
- Ne weke dîtina xwe ye.

**Qam qama mêşan deng dengê gamêşan:**
- Bi heman wateyê.

**Tel telê mêşan e qîr qîra gamêşan e:**
- Bi heman wateyê.

**Varik e, hêkên hesinî dike:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER BIRYAR Û BAWERIYÊ**

**Ava wî paqij e:**
- Karê wî saxlem e; karê xirabe nake; yê baweriyê ye.

**Dilê min rûnişt:**
- Min bawer kir; gumanên min neman; ez ji dudiliyê rizgar bûm.

**Dilê min lê rûnişt:**
- Bi heman wateyê.

**Dilê min li ser rûnişt:**
- Bi heman wateyê.

**Em dilên xwe bi cih bikin:**
- Bila dilê me rihet bibe; bila em yekdil bibin.

**Firêzeya wî paqij e/pirêzeya wî paqij e:**
- Karê wî saxlem e; karê xirabe nake; yê baweriyê ye.

**Gotina wî û serê wî yek e:**
- Xwediyê soza xwe ye; gotina xwe naguherîne.

**Pişta min jê rast e:**
- Saxlem e; zûbizû tiştek pê nayê; ez bi qayîmbûna wî bawer im.

**Xwe yekdil kir:**
- Xwe ji dudiliyê rizgar kir; gumanên wî neman; baweriya wî çêbû.

**Yekdil e:**
- Biryara xwe daye; xwe ji dudiliyê rizgar kiriye; guman pê re nemane.

**LI SER QÎMETNEDAYÎNÊ**

**Bila bimire hê caw erzan:**
- Mirovekî beredayî ye; ti wateya gotina wî nîne; ji xwe re dibêje. (Kesê ku tiştên ne li gorî aqil, yan jî ne li gorî kesên din dibêje jê re tê goti)

**Bila bimire hê mirin erzan:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Gerîla xwedî li hawara Şengalê derket’



Di salvegera 10’emîn ya komkujiya Şengalê de, pilan û siyasetên qirkirinê yên li dijî civaka Êzidî dewam dikin. Fermana ku bi hevkariya dagirkeriya Tirk û PDK’ê pêk hat, Îro jî dewam dike. Jinên civaka Êzîdî yên Efrînê diyar kirin ku li Şengalê Gerîlayên Azadiyê, YPG û YPJ e bûn hêza yekem ya parastina mirovahiyê.**R-2**

## Xwendina ramanên Rêber Apo rêya fêmkirina pêvajoyê ye

**Dengê gelê kurd bi ramanên rêber û pêşengê serdema azadiyê ya nû Rêber Apo li tavahî cîhanê hatiye belavkirin.R-6**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1192 | 4-Tebax-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# ŞENGAL; JI KOMKUJIYÊ BER BI XWESERIYÊ VE

Di 3’yê Tebaxa 2014’an de, bi armanca qirkirina civaka Êzidî, çeteyên DAIŞ’ê bi çekên giran berê xwe dan Şengalê, li ser xaka wê ya pîroz komkujiyên mezin pêk anîn û bi hezaran jin û zarokên Êzidî revandin. PDK’ê beriya fermanê hêzên xwe yên leşkerî ji Şengalê kişandin û bû hevkara komkujiyê. Li hemberî êrişa hovane ya DAIŞ’ê ;Gerîlayên Azadiyê, YPG û YPJ’ê bi fedekariyeke mezin berê xwe dan Şengalê û bi hezaran gel ji mirinê rizgar kirin.**R-5**



## ‘Divê sendîqayên rojnamevaniyê xwedî helwestên bi bandor bin’



Rojnamevan Ehmed Umer da zanîn ku Silêman Ehmed bi tawanekî ji rastiyê dûr hat cezakirin. Herwiha Umer diyar kir ku heta rojnamevan Silêman Ehmed were azadkirin û rê li pêşiya kiryarên PDK’ê de were girtin, pêwîste Sendîqeyên Rojnamevaniyê, Navenda Metro û gelên Başûrê Kurdistanê xwedî helwestên bi bandor bin.**R-3**

## Dîroka PDK’ê a reş; Li Başûrê Kurdistanê

Ji dîrokê ve û heta niha, herdem PDK’ê bi xiyanet û rûreşiyê cihê xwe di nava rûpelên wê de girtiye. PDK’ê di sala 1992’an de li hember xeta Jina azad û berxwedêr a Şehîd Bêrîtan, xiyaneta xwe eşkere kir. Herwiha her ku xeta têkoşînê mezin bû, PDK’ê jî xiyaneta xwe mezin ki.**R-4**



## Ji çiraxên hunera kurdî



Hunermend Zekeriya Efrîn Stûneke neteweyî ya bilind û nirxeke hunerî ya mezin e .Dema ku afirandêrî û jêhatîbûn têkil hev dibin û pêlên henasî û hestan di atûna hunerî û çêja xweş de digihêjin hev.**R-7**

**Olympeyên hemdem Pexşan û Şerîfe**
Zozan Cizîrî R-2



**Berxwedana Gerîla Misogeriya Pirrengî, Azadî Û Demokrasiyê Ye**
Idrîs Henan R-5

# ‘Gerîla xwedî li hawara Şengalê derket’

Di salvegera 10’emîn ya komkujiya Şengalê de, pilan û siyasetên qirkirinê yên li dijî civaka Êzîdî dewam dikin. Fermana ku bi hevkariya dagirkeriya Tirk û PDK’ê pêk hat, Îro jî dewam dike. Jinên civaka Êzîdî yên Efrînê diyar kirin ku li Şengalê Gerîlayên Azadiyê, YPG û YPJ e bûn hêza yekem ya parastina mirovahiyê.

**Zana Roj/ Şehba**

Di 3’yê Tebaxa 2014 an de Civaka Êzîdî li Şengal ji aliyê çeteyên DAÎŞ ê ve hate hedefgirtin, bê guman ev ferman yek ji berdewamiyên qirkirina Civaka Êzîdî yên di 74 fermanyên derbasbûne de hatiye dîtin de ye. Di dagirkirina Şengalê de dijminê gelê Kurd û bi taybet dijminê ku bi sala ye şerê Tevgera Azadiya Kurdistan dike, siyaseta qirkirina dîrok û gelê resen yê Kurd di şexsê Şengalê de pêk bînin. Hikumeta Îraqê û PDK’ê li hember komkujiya ku li ser gelê Şengalê dihate kirin, weke peykerekî temaşe dikir. Ev bê dengiya wan jî; hevkariya wan di qirkirina Civaka Êzîdî de tekez kir.

Piştî rizgarkirina civaka Êzidî ya ji Fermana 3’yê Tebaxa 2014’an û ragihandina Rêveberiyên Xweser a Şengalê, hêzên Parastinê



yên Şengalê YBŞ/YJŞ û Asayîşê Êzidxanê hatin avakirin. Herwiha saziyên xizmetguzariya û rêxistibûna gel rûj bi roj pêş ket. Lê li beramberî destkeftiyên gelê Şengalê, êrîşên dewleta Tirk a dagirker roj bi roj zêdetir bûn. Dagirkeriya Tirk û bi alîkariya PDK’ê êrêşên xwe yên ser Şengalê dewam dike. Di van êrîşan de pêşengên civaka Êzidî û têkoşerên kurd û kesayetên welatparêz dibin armanc. Ji ber ku fermana ku dixwestin bi destê DAIŞ’ê pêk bînin negihişt armanca xwe, niha ew bi xwe ketine dewrê û Şengalê û Îradeya gelê dikin armanc. Tevahiya van êrişan jî li pêş çavê cîhanê pêk tên û cîhan wekî her car xwe bêdeng dike.

Têkildarî salvegera 10’emîn ya komkujiya Şengalê, Hevseroka Yekîtiya Êzîdiyên Efrînê Meryem Cindo û Endama Koordînasyona Yekîtiya Jinên Êzîdî ya Rojava Filê Şekro ji rojnameya me re axivîn.

**‘Di şexsê Civaka Êzîdî de gelê kurd dikin hedef’**

Meryem Cindo di destpêkê de hemû fermanên ku li ser civaka Êzîdî rabûne şermezar kir û wiha axivî: “Fermanên ku li ser civaka Êzîdî rabûne êşeke mexin di dîrok û dilê her êzîdiyekî/ê de hêştiye. Di salvegera 10 emîn ya dagirkirina



Meryem Cindo

Şengalê de em hemû ferman û qirkirinên ku li ser gelê Êzîdî hatine kirin lanet û şermezar dikin. Bi rastî fermana herî dawî ya ku di şexsê Şengal de hatiye kirin, kîn û nefreta dijminên olperest û nijadperest yên li dijî civaka Êzîdî careke din derxist holê. Dijmin dîroka civaka Êzîdî gelek baş xwendiye û dizane ku civaka Êzîdî dîroka gelê temsîl dike, di fermana dawiyê ya ku bi destê kedayetên ku banga îslamiyetê dikin DAIŞ ê xwestin gelê Kurd di şexsê gelê Êzîdî de qir bikin.”

**‘Jin li bazaran hatin kirîn û firotin’**

Meryem diyar kir ku jinên Êzîdî di bazaran de hatin firotin û wiha domand: “Di Fermana Dagirkirina Şengalê de neheqî û sûca herî mezin li dijî jinên Êzîdî hate kirin. Jinên Êzîdê rasterast di bazarên DAÎŞ ê de hatin kirîn û firotan. Her wiha bi hezaran jin û zarokên temen biçûk yên Êzîdî di destirêjî, tecawîzkirin û kuştinê re derbas bûn. Hemû pîvanên mirovahiyê



Filê Şekro

di wir de hatin tunekirin û di bin bêdengiyeke navnetewî de ev yek hate pêk anîn.”

**‘Gerîla xwedî li hawara Şengalê derket’**

Meryem destnîşan kir ku li hember parastina Şengalê her kes xwe da aliyekî û Şengal bi destê Tevgera Azadiyê hate parastin û wiha got: “Di encama lihevkirineke navnetewî de ku di hevdîtina 9 ê Cotmehê de hatibû pilankirin biryara dagirkirina Şengalê hatibû standin. Di wê demê de hemû hêzên herêmî li ser Şengalê bibûn yek û rê li pêşiya dijmin vekir ku were dagirkirin. Di dîroka Şengalê de em tu carî ji bîr nakin ku Kurdên xwefiroş bûn destek di qirkirina civaka Êzîdî de û çawa ku hêzên Pêşmerge xwe dan aliyekî û pêşî li dagirkeriyê negirtin ev yek misoger kir. Hawara Şengalê ya ku di ser guh û hişê her kesî di cîhanê re derbas bibû, xwedîderketina li vê hawarê tenê Tevgera Azadiya Kurdistan Gerîlayên Azadiyê, YPG û YPJ lê derketin. Parastina Şengalê û têkbirina pilanên dijminên derve û yên navxweyî bi destê Gerîlayên Azadiyê hate kirin û ev yek îsbat kir ku Tevgera Azadiyê hêza yekemîn ya ku li hember DAÎŞ ê sekinî û civaka Êzîdî ji lepên qirkirinê parast. Ev serkeftin bi serbilindî bi saya Gerîlayên Azadiyê em tînin ser ziman û xeta îxaneta ku tê de hatiye meşandin emê tu carî ji bîr nekin.”

**Bi derbasbûna 10 salan re jinên Êzîdî li benda rizgarkirinê ne**

Her wiha Filê da zanîn ku heyanî niha jin û zarokê Êzîdî di bin destê terorê de ne û wiha got: “Qirkirina ku di Şengalê de hatiye pêkanîn de, bi hezaran zarokên keç û jinên Êzîdî hatin dîlgirtin û di nava terorê de man. Ev yek heyanî niha jî berdewam e, di Kampa Holê de bi deh caran jinên Êzîdî hatin rizgarkirin. Bê guman ev yek bi dawî nebûye û heyanî niha jinên Êzîdî dîlgirtî hene û li benda rizgarkirinê ne. Bê guman di vê çarçoveyê de hêzên parastina jin xebatekî gelek mezin dan meşandin da ku wan jinan rizgar bikin û ev yek pirî caran di hevdîtin û vegotina serpêhatiyên jinên rizgarkirî de hat dîtin êş û îşkenceya ku di nava lepên wan de didîtin.”

**‘Şengal bi sekna xwe ya niha bersiva hêzên qirker dide’**

Filê bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: “Di serdema 21 emîn de xwedîderketina li mirovahiyê, gelê Kurd, ol û baweriyên li ser erdê tenê di felsefeya Rêber Abdullah Ocalan de hatiye pêkanîn. Ev yek di di dagirkirina Şengalê de û li pêşiya hemû hêzên qirker yên navnetewî û herêmî hate tekezkirin. Em li ser vê felsefê xwe mezin dikin, û cawa ku Rêber APO ji me re diyarkiriye ku em dîroka Gelê Kurd yê resen temsîl dikin û çawa xwedî li Şengalê derketin, em jî soza xwedîderketina li felsefe û pirojeya Rêbertî didin. Îro bi hezaran Civaka Êzîdî xwe di bi Pirojeya Netewa Demokratîk de xwebirêxistin kirine. Şengala îro ku tê de rengê xweşikbûnê, aşîtiyê û demokrasiyê diheje, bersîva herî tund ya hêzên qirker di cîhanê de da.”



**Ramangeh**

**Olympeyên hemdem pexşan û şerîfe**

Zozan Cizîrî

Sal 1793, jineke fîlozof, nivîskar, parêzvana mafên jin û aktîvîst navê xwe Olympe de Gouges, di çaxê Şoreşa Fransiz de ji ber bi fikir û baweriya ku tîrantiya zilaman a li ser jinan çavkaniya hemû şiklên newekheviyê, bêedaletiyê û zilma li ser civakê ye, têkoşîneke watedar dimeşîne, ji aliyê hêzên dewletê ve tê girtin, dadgeh yekser biryara îdamê digire û roja 3’yê Mijdara heman salê bi giyotînê serê wê dibirin. Dadgeha Fransa belkî Olympe de Gouges ji bo berjewendiyên desthilata xwe bi neheqî qetil kirin, lê ma karîn fikra wê û têkoşîna wê ya ji bo azadiya jin û edaletê jî tune bikin? Na! Berevajî, raman û têkoşîna wê ya ji bo azadiyê, dadperweriyê û bidestxistina mafên jin nifş bi nifş berdewam kir, di tevahî cîhanê de ji bo gelek têkoşînên jinan bû îlham û gihîşt heya roja îro. Di vê sedsala 21. de rastiya dewletê ya qatilê jin û giştî civakê ku tu pêwendiya xwe bi nirxên civakî û exlaqî re nemaye, careke din xwe eşkere dike. Rejîma Îranê ya paşverû û zalim, van rojên nêz biryara îdamê li du jinên Kurd ên bi navê Pexşan Ezîzî û Şerîfe Muhemmedî birî. Bi taybetî Pexşan Ezîzî, niha weke jineke pispora xizmetên civakî, parêzvana mafên jin û rojnamevan li Zîndana Evîn a Îranê di bin zilm û êşkenceyeke giran de ye. Şerîfe Muhemmedî jî, berî her tiştî jineke zewicî û dayîka zarokekê ye. Her du jî, bi tohmeta “li dijî rejîma Îranê serhildana çekdarî meşandine” îro bi xeteriya îdamkirinê re rû bi rû ne. Em hinek paşde biçin û vegerin wan rojên destpêka Serhildanên Jin, Jiyan, Azadî. Heman rejîma Îranê ya paşverû, dilxwede pêkhateyek bi navê “polîsên exlaq” erkdar kiribû û yek ji kiryara wan a bi navê “exlaq”, bi bêexlaqî qetilkirina keça Kurd Jîna Emînî bû. Bi vê bûyera kuştinê re esas sekin û kiryarên wan ên derveyî exlaq bêhtir eşkere bû û riswa bûn. Lewre her kesê bi vê bûyera jandar û neheq hesiya, qetilkirina Jîna Emînî wek êrîşek li ser tevahî jinan zanî û her der bû meydana serhildanê. Ango qetilkirina Jîna Emînî wek çirûskekê bû wesîle ku tevahî xelkên li Îranê û cîhanê bi yek dengî li hemberî dewleta Îranê ya paşverû-zilamperest helwesta pêwîst bi serhildanên girseyî raber bikin.

Wekî rastiyeke siyaseta hêzên desthilatdar ên cîhanî ya roja îro, di serî de dewleta Tirk û Îsraîl hemû dewletên şirîk ên NATO’yê ji her milî ve hewl didin dewleta Îranê tengav bikin û hilweşînin. Lê di kesayeta Pexşan û Şerîfe de tevahî jinên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê sîstemek demokratîk, azadiya jin û civakê dixwazin. Ev daxwaz ne parçekirin û hilweşandina dewleta Îranê, berevajî rêya çareseriya demokratîk vedike. Ango pêşeroja dewleta Îranê ne bi darvekirina Pexşan û Şerîfeyan, bi naskirina dijminên rast dikare misoger bibe. Hêja ye mirov bibîr bixe ku çawa dewleta Fransa bi rêbaza giyotînê qetilkirina Olympe nekarî fikra wê asteng bike û tune bike, îro jî rayedarên dewleta Îranê bi rêbaza îdamkirinê ne dikarin agirê serhildanên “Jin, Jiyan, Azadî” yê di nav dilê jinan û gelan de gur bûyî vemirînin, ne dikarin ruhê azadîxwaz ê jinan tune bikin, ne jî pêşeroja xwe hildin saxlemiyê. Di vê çarçoveyê de dewleta Îranê niha di neqeba du rêyan de ye; yan wê biryara çareseriya demokratîk bide, dawî li îdaman bîne û aştiya civakî pêk bîne, yan jî wek dewleteke serhişk di bin lingê desthilatdarên kapîtalîst de bipelixe.



# Ji çiraxên hunera kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Zekeriya Efrîn Stûneke neteweyî ya bilind û nirxeke hunerî ya mezin e .

Dema ku afirandêrî û jêhatîbûn têkil hev dibin û pêlên henasî û hestan di atûna hunerî û çêja xweş de digihêjin hev, berhemeke hêja tê afirandin ku bedewî û heyraniyê derdixe holê, ji ber vê yekê dil ber bi wê ve dikişîne û atmosfereke geş di giyanê wergiran de çêdibe da ku kar bibe encama serkeftin û afirîneriyê.

Dema ku em behsa afrînerî, nûjenî û geşbûnê dikin, em behsa kurê Çiyayê Kurmênc, kurê dara zeytûnê, kurê bajarê çand û hunera kurdî, kurê Efrîna berxwedêr “Zekeriya Efrîn” dikin, ê ku hatî firşikkirin bi bêhna pelên darên zeytûnê yên “Deşta Çûmê”, bi hêlma kulîlkên hinarên “Basûtê”, bi şeraba wîşiyên tirî yên “Endarê”, ji vexwarina ava kaniyên”Meydankê” û sulavên “Gemrûkê” û bi xweşikbûna şûnwarên “Kela Horî” û bihnxweşiya dîroka wê, ku ji Kaniyên lehengiya Îbrahîm Henano, Rifet û Seydo, û xwendekarê rêbazên dibistana Cemîl Horo, Elî Tiço û Têkoşer hatiye hêvankirin.

Zekeriya Efrîn hunermendek e ku bi jêhatîbûn li têla afirînerîyê dixe, bêguman, em nikarin ji awazê afirînerîyê matmayî nemînin! Ew yek ji sembolên huner û wêjeya (edebiyata) kurdî tê hesibandin. Ew stûneke hunerî ya bilind e, ew bejneke wêjeyî ya bi berz e, afirînerekî bê nîşe ye. Wî bi awazên xwe muzîka kurdî zengîn kiriye û bi nivîs û helbestên xwe di dewlemendkirina çanda kurdî de rolek lehîstiye.

Helbestvan, muzîkjen û derhênerê kurd Zekeriya Efrîn di 03.05.1974’an de ji dayîk bû, ji dê û bavekî kurd (Hesen Dawûd û Gulê Xelîl) li bajarê Efrînê, ji malbateke welatparêz ya têkoşer ku kevneşopiyên civaka Efrînê parastiye û pabendî hînkirin û nirxên Kurdayetiyê bû.

Dibistana seretayî, amadeyî û lîse li bajarê Efrînê xwend û dema xwendina xwe ya lîseyê bi dawî anî, koçî bajarê Helebê bû, li wir Peymangeha Elektrîkê xwend, piştî derçûna xwe, li bajarê Helebê tevlî Amûjgeha (Peymangeha) Muzîkê bû û li wir di sala 1991’î de qedand û derçû.

Meyla xwe ya wêjeyî û hunerî, hezkirina xwe ya ji bo nivîsandina helbest û gotaran û hewesa xwe ya ji bo muzîk û stranbêjiyê ji za-



rokatiya xwe ve dest pê kir, di dema dibistana navîn de, ji ber vê yekê di destpêka xortaniya xwe de tevlî Koma Engîzek - Efrînê bûye û weke endamekî çalak di beşa muzîk û govendê de dixebitî.

Piştî derçûna ji Amûjgeha Mûzîkê jiyana xwe ji bo huner, çand, nivîskarî û muzîka kurdî terxan kir. Di salên notî yên sedsala borî de dest bi nivîsandina helbest, gotarên wêjeyî û lêxistina amûrên mûzîkê kir.

Di sala 1994’an de gelek helbest bi zimanê kurdî nivîsandin û belav kirin, weke: (Evîna Min, Rêwiya Min, Axa Welat, Randê Kurdistan.. hwd).

Helbestvan Zekeriya Efrîn bi demê re gelek berhemên din ên wêjeyî nivîsandin û di demên cuda de çend dîwanên helbestan bi zimanê Kurdî çap kirin, ew jî:

1-Dîwana yekem, bi navê “Lîlav” yekem berhema wêjeyî di sala 2001ê de hat çapkirin.

2-Dîwana duyem, “Pêlên Birîndar” di sal 2004’an de hat çapkirin.

3-Dîwana sêyem: “Peyv dibe bîranîn”, di sala 2006’an hat çapkirin.

4-Dîwana çarem, “Sê Doz”, di sala 2021’ê de hat çapkirin.

5-Dîwana pêncem: “Em hene” li ber çapê ye .

Zekeriya Efrîn, di cîhana afirandêriyê de pêşeng e, helbestan bi tîpên zîv dinivîse û ramanên bi tîpên zêrîn dineqişîne.

**Afirîner û diyar e**

Wekî her carê, ew bi ruhê afirîneriyê re hemaheng e û semfoniyên nûjeniyê lêdide, xwedan şiyaneke mezin e ku bi ramana xwe ya bi rûmet rê ji nifşên pey were ronî dike.

Hunermendekî bê sînor e, ji gotin û ramanan tabloyan diafirîne ku bi giyan re diaxive û dighêje dilan. Dema ku mirov berhemên helbestvan Zekeriya Efrîn dixwîne, bedewiya xwezaya Kurdistanê, evîna rasteqîn, wêrekiya zarokên welat û coşa jinên Kurd di wan de dibîne, wî gelek helbest li ser berxwedana lehengên Kurdistanê û şehîdên azadiyê, li ser bedewiya Kurdistanê, azadî û jinan, li ser Efrîna birîndar, evîn û aştiyê bi şêwazekî xweş ku dikeve dilan û giyanan şa dike, nivîsandine.

Zekeriya Efrîn, hunereke mezin a afirîner e, û rewşeke hunerî ya bêhempa ye, hebûna xwe di qada hunerî ya li Rojava û derveyî wê de îspat kiriye û gelek tişt pêşkêşî çanda kurdî kiriye bi rêya destpêdanên xwe yên hunerî, stranên xwe yên xweş ên rengereng, bi gotinên xwe yên nazik û bedew, bi peyv û biwêjên xwe yên watedar ku şarezayî, bedewî û ronahî jê diherike...

Ji bo şarezayiya xwe ya wêjeyî (edebî ) û hunerî xurtir bike, di gera xwe ya yekem de berê xwe dide bajarên Herêma Kurdistanê



Zekeriya Efrîn

(Hewlêr – Kerkûk – Dihok - Silêmaniyê û şengalê), bajarên Iraqê (Besxa û Mûsil) û bajarên Bakurê Kurdistanê (Amed û Cizîra Botan) di salên li pey hev de (1995 - 1996 - 1997) digeriya, û di gera xwe ya duyemîn de di salên (2000 - 2001 - 2002) de bi daxwaza zanist, çand û zanînê, di gelek saziyên hunerî û perwerdeyî, rojname, rojnameyên wêjeyî û çandî de di warên lêkolîn, nivîskarî, hunerî û muzîkê de dixebitî, piştî wê dîsa carek din vegeriya Rojava li hembêza Efrîna delal.

Hunermend Zekeriya Efrîn, di nava civaka hunerî de hevala xwe ya hunermend Yara Hebîb ji Amûdê nas dike û di sala 2005’an de dizewicin, sê keç ji wan re çêbûn bi navên “Firîşte, Surişt û Buhişt”. Di dibistana wan ya hunerî û çandî de mezin bûne, ji çavkaniyên wan yên hunerî û niştimanperwerî vexwarine û li zimanê kurdî xwedî derketine, hezkirina huner û dengbêjiyê û dersên welatparêzî û hunerî ji wan standine, rêya wan şopandine di warê muzîk û hunerê de û ew bûne sedema ku zarokên wan di cîhana huner û stranbêjiyê de gelek serkeftinan bi dest bixin; Firîşte bû stranbêj û hunermendeke jêhatî ku distirîne û gîtarê lê dide, Buhişt bi lêdanê (defê) dixebite û Surişt jî li piyanoyê dixe. Hevjîna wî Yara Hebîb û keça wî Firîşte Efrîn stranan dibêjin û heta niha gelek stran ji berhemên wan di televîzyon û malpêran de hatine belavkirin.



Hunermend Zekeriya Efrîn karê xwe ne tenê bi nivîsandina helbest û mûzîkê sînordar kiriye, lê wî ji helbestên xwe gelek stran çêkirine, bi dehan komên mûzîkê û xwendekar li ser amûrên mûzîkê, notên mûzîkê û stranbêjiyê perwerde kirine û gelek kilîpên hunerî û belgefîlm derhênerî kirine.

Wî ji gotinên helbestên xwe yên gelek stran çêkirine ji aliyê gelek hunermend û komên hunerî yên kurd ve hatine gotin, di nav wan de:

- Rêwiya min
- Tîrêja Rojê
- Em Jinên Kurdistan
- Gava min tu dîtiye
- Lorîka min
- Zerdeştê Kalim...hwd.

Serkeftin nû dibin û enerjî diteqin, awazên şîrîn li têlên afirînerîyê dixin, jêhatîyên ku derketine holê xwestin ku paşerojê biafirînin, ji ber vê yekê, ew fikirîn û xebitîn û afirînerî kirin, ji hemû astengan derbas bûn, tevî derfetên hindik, wê yekê nekarîbû xebata Zekeriya Efrîn rawestîne. Ew hest û xeyalên xwe bi kar tîne, ji bo derhinerkirina xebateke teknîkî ya afirîner, wî raman û amûrên sade bi kar anîne ku alîkariya wî kirine di wênekêşî û hilberînê de, da ku derhinêriya berhemên hunerî yên dewlemend li asteke bilind bike. Di nava xebatên xwe yên hunerî de derhêneriya gelek fîlmên belgeyî û hunerî kiriye, weke:

- Çiyayê Kurmênc
- Şûnwarên dîrokî
- Efrînê Evînê
- ZIMNAKO
- Baba Şêx
- Maf û Binpêkirin
- Jiyannameya hunermendên nemir (Cemîl Horo - Elî Tico - Ednan Dilbirîn û Seîd Yûsif...)

Her wiha derhêneriya gelek klîpên hunerî ji hunermendên Rojava û Kurdistan re kiriye wek:

- Ibrahîm Kêvo
- Yara Hebîb
- Hojîn Hêriz
- Stêr Kurdaxî
- Firîşte Efrîn
- Aras Agir
- Ecîb Îbrahim
- Ezîz Xemcivîn
- Yara Ehmed
- Fehid Cezrawî
- Hozan Gever
- Gare Sazkar
- Yusif Rojava
- Ferhad Baghanadî
- Şîlan Zemanî
- Arkan Cemîl
- Selah Beyrem
- Elî Aştî
- Yasîn Botan û Ehmed Çetelê

Her wiha bi dehan hunermendên din. Tevî çend hevalên xwe di damezrandina çend komên hunerî de beşdar bûye weke :

1-Koma Kulîkên Medy, Koma Larês, Koma Avrî, Koma Ciwanên Nûjen û Koma Nehewend Her wiha, ew endamê Rêveberiya Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) ye.

Nûvekirina wî ya berdewam û afirîneriya wî ya domdar, wî dike mirovekî ku di esmanê hunerê de mîna stêran bibiriqe, destpêdanên wî yên diyar û hûrguliyên wî yên ku dixwaze wan diyar û afirîner bike, ji me re vedibêjin ku ew mirovekî mezin e weke wî di cîhana huner û afirandinê de kêm in.

Peyv û tîpên wî nazik in, mîna çemekî sar in ku tîbûna dilan ditemirînin û tîpên xweşik dilan xweş dikin, birînan derman dikin û biwêjên hêja dil pê xweş dibin û giyan pê şad dibin. Ji wî re serkeftin, afirînerî û ronahiyeke zêdetir dixwazim

# Xwendina ramanên Rêber Apo rêya fêmkirina pêvajoyê ye

Dengê gelê Kurd bi ramanên rêber û pêşengê serdema azadiyê ya nû Rêber Apo  li tavahî cîhanê hatiye belavkirin. Ji bo piratîkirina felsefeya azadiyê xwendina wê pêwêste, li ser vê bingehê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest bi xwendina ramanên Rêber Apo kirin e.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Xwendin, analîzkirin û fêmkirina felsefeya Rêber Apo bi hurguliyên wê, dibe stûna herî bingehîn di avakirina civaka ku bi sedê salan  di nava lepên dagirkeriyê û hêzên kapîtalîst de jiyan dikin de ye. Bi taybet ji bo gelê Kurd xwendina felsefeya Rêber Apo yek ji gavên herî girîng di fêmkirina siyasetên ku li dijî gelê Kurd hatine û tên kirin, naskirina rastiya dijmin û kesayeta Kurd her wiha têkoşîna ji bo doza azadiya Kurdistan di serdema nû de divê çawa biser bikeve daye diyarkirin. Li gorî pêvajoya heyî û herikîna pê re, divê xwendina Parezname û pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan bi geşkirî di nava tavahî civakê de bê belav kirin.

Bi taybet ev felsefe bandora xwe di nava tavahî gelên cîhanê yên azadîxwaz de da ye teysandin, ji lewra di nava rayên giştî û yên navnetewî de Rêber Abdullah Ocalan dibe mijara nîqaşê û metirsiya wan ji vê yekê avadibe. Ji bo zêdetir ev fikir di nava gelê Kurd û pêkhateyên di nava herêmên Rêveberiya Xweser de jiyan dikin de bê zelalkirin, xwendina pirtûkên Rêber APO dibe çandek. li herêma Şehbayê jî ev yek bi riya lidarxistina çalakiyên berfireh ji aliyê tavahî sazî û partiyên li herêmê ve tê pêkanîn. Herî dawî ji aliyê Partiya Yekîtiye Demokrat PYD ê ve çalakiyeke berfireh bi tevlîbûna bi sedan hate lidar xistin. Girêdayî girîngiya xwendin û fêmkirina felsefeya Rêber Apo bi hemû çaxên wê, endamê Meclîsa Giştî ya PYD’ê li Kantona Efrîn û Şehbayê Luqman Jaro ji rojnamya me re axivî.

**Îdeolojiya Rêber Abdullah Ocalan rêbazê jiyana îro û ya pêşerojê ye**

Luqman anî ziman ku armanc me valaderxistina pilanên dijmin li ser gelê Kurd e û ev gav bersîvdayîna me ye û wiha got: “Di nava geşedanên siyasî yên ku tên dîtin de, bi tayebt Rêber Abdullah Ocalan bûye yek ji mijarên sereke. Faşîzma Tirkiyê tavahî hewildanên xwe di çarçoveya ku doza Rêber Apo di nava navnetewî de weke girtiyekî ji rêzê bigire dest û ev dosiye di raya giştî de neyê vekirin de dike. Herî dawî tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo weke ceza dan nîşandin ku tecrîd nîne û Rêbertî bi rihetî jiyan dike, tenê di aliyê hevdîtinan de ceza heye. Ev yek bi serê xwe weke sûce û divê li hember wê helwesta gelê Kurd, parêze, siyasetmedar û ya CPT’yê  derkeve holê. Faşîzma Tirkiyê di dirêjiya ewqas sal di girtina Rêbertî de armanca wî ew e ku ev felsefe bi girtin û tecrîdê re bê tunekirin û derbasî nava gel nebe. Her çendî di vê pilanên xwe yên qirêj li ser hesabê tenduristiya Rêber APO pêk anîn; lê belê ev yek bi tu awayî nehat pêkanîn û berhemên vê felsefê îro em di destkeftiyên gelê Kurd de dibînin.

Lidarxistina çalakiyên bi vî rengî di bingeh de bersîvdayîna ji pilan û siyaseta Dagirkeriya Tirkiyê re ye. Bila îro bala xwe bidê ji zarokên Kurd bigire heyanî kal û pîrên wê xwe li ser îdeolojiya Rêber Apo perwerde dikin û vê yekê dikin rêbaza jiyana xwe û ya pêşerojê. Ev çalakî wê domdar bin û emê bi van helwestan pilanên dijmin li ser Serokatî û gelê Kurd valaderxin.”

**`Rêber Apo çareseriya tavahî alozî û pirisgirêkên cîhanê diyar kiriye`**

Luqman da zanîn ku çareserî di fêmkirina îdeolojiya Rêber APO de ye û wiha pê de çû: “Di jiyan û rastiya ku em tê de jiyan dikin de pêwîstitiya me bi fêmkirina lêhurbûn û îdeolojiya Rêber APO heye. Di Kurdistanê, Rojhilata Navîn de û di guhartina zihniyeta heyî ya serweriya xwe li ser hemû



şaneyên mirov kiriye, pêkanîna felsefeya Rêbertî ew çareseriya bingehîn ya domdar e. Bi taybet di aloziyên ku Rojhilata Navîn tê de jiyan dike de tu çareseriyên bingehîn nehatin pêşkêş kirin, di encama pêşbîniyên çareseriyê yên ne guncav û li gorî berjewendiyên hêz û aliyên ji derve de, her tim xwestine ku di rewşa xwe ya heyî de bimîne. Rêbertî pirisgirêk û hêza çareserkirina tavahî pirisgirêkan di parezname û pirtûkên xwe da ye diyarkirin, û ev yek di Pirojeya Rêbertî ya Netewa Demokratîk di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de tekez bû ye.”

# Heyva Sor a Kurd; avabûn û xebata wê

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Hevserokê Heyva Sor a Kurd Dilgeş Îsa diyar kir ku Heyva Sor a Kurd ji 11 kesan karîbû xebata xwe di sala 2012’an de bide destpêkirin. Herwiha Îsa da zanîn ku Heyva Sor di hemû rewşên awarte, şer û nexweşiyan de bi dirêjahiya şoreşê re destek dida civakê û heta roja îro jî xebat û perwerdeyên hişiyariyê ji bo gel tên pêşkêşkirin û dayîn.**

Heyva Sor a Kurd, saziyeke civakî ye armanca wê ya sereke destekdayîna tendurstî ji bo civakê ye. Di heman demê de erka wê li hember gel, pêşkêşkirina alîkariyan di rewşên awarte de ye.  Heyva Sor a Kurd li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar û xebata ji bo civakê dike. Herwiha 23 nexweşxane û navendên tendurstiyê, hem jî 12 navendên rewşên awarte, 65 ambolans û 5 kilînkên gerok û hezar û 200 endam li tevahiya herêmê hene. Lewma ji sala 2012’an ve bi awayekî rojane kar û xebat dike.

Girêdayî avabûna Heyva Sor a Kurd û kar û xebata wê, hevserokê wê Dilgeş Îsa ji rojnameya me re axivî.

**Destpêka avabûnê**

Dilgeş Îsa di derbarê avabûna Heyva Sor a Kurd de wiha axivî: “Heyva Sor a Kurd di 12’ê Berfanbara 2012’an de li bajarê Amûdê ji 11 bijîşk û kesên xwende hat damezrandin. Armanc jê ew bû; em saziyeke ku destek û alîkariyê bide gel, ava bikin. Êdî li gor zagonên Xaç û Heyva Sor a Navnetewî me Heyva Sor a Kurd damezirand.



Di destpêka aloziya Sûriyê de rewşa herêmê pir tevlîhev bû û hikumeta Şamê jî gelekî paşgukirin xistibû warê tendurstî û xizmetguzariya gel. Li aliyekî din jî yekem êrişa ku hat li ser herêma me, êrişa Serêkaniyê bû xebata me ji wê demê dest pê kir. Gelek şêneyên Serêkaniyê koçberî kamp, gundewarên bajarê Hesekê bûn, alîkariya wan jî erkek bû û diket ser milê me. Di wê demê de bi rastî kar û xebat pir zehmeta bû, destkdayîn û alîkariya ku ji bo me dihat krin jî lewaz bû. Gelê me destek dida me, erebeyên xwe dixistin xizmetê. Hem jî destkdayîn ji aliyê gelê kurd yên Bakur û Başûrê Kurdistanê û yên derveyî welat ve bo Heyva Sor a Kurd dihat dayîn. ”

**Ji destpêka avabûnê ve xebata Heyva Sor**

Îsa girêdayî xebata Heyva Sor a Kurd ji destpêka avabûnê heta roja îro wisa domand: “Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re hêzên YPG û YPJ’ê hatin damezrandin û êriş ji aliyê DAIŞ’ê û komên çete ve li ser herêma me çêbûn. Di wê demê de gelek sivîl û hêzên me birîndar dibûn, em jî li gor zagonên Heyva Sor a Navnetewî ji bo dermankirina wan birîndaran tev digeriyan û alîkariya wan dikir. Destpêkê êriş li ser Serêkaniyê, piştre, Tiltemir, Tilhemîs, Kobanê, Efrîn, şerê Şengalê û pêşwazîkirina koçberên Şengalê, dîsa jî Serêkaniyê Girêspî. Di van êrişan de gelek rewşên mirovî yên zehmet çêbûn, bi hezaran gel jiyana xwe ji dest da, birîndar bû û koçber bû. Herwiha alîkariyên lezgîn ji gel û şervanên YPG û YPJ’ê pêşkêş dikir. Di heman demê de çi dermanê ku hewcedariya gel pê hebû me ji nexweşan re pêşkêş dikir.Di nav re jî gelek nexweşî li herêmê belav bûn weke Laşmaniya, Cereb, Kolêra herî dawî Covîd 19 derket, me jî di nav gel de û li kampên koçberan cihên tendurstiyê çêkirin. Dema ku erdhej di 6’ê Sibata sala bûrî de çêbû xebatek mirovî ji bo xelkên Şehba û Şêxmeqsûd yên ku ziyan gihaşt wan, hat pêşkêşkirin. Wekî me anî ser ziman di destpêkê de alîkariya ku ji me re dihat pir sînordar bû, piştî ku Hêzên Hevpeymanî ketin herêmê êdî destekdayîn ji aliyê rêxistin û saziyên navnetewî ji bo me hat dayîn. Bi pêşveçûna şoreşê re êdî Heyva Sor a Kurd hin bi hin xwe ava kir û li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê xebata xwe berfirehtir kir. Bi saziyên tendurstî yên Rêveberiya Xweser kar û xebat ji bo gel da meşandin. ”

**Êrişên ku li ser ekîbên Heyva Sor a Kurd hatin pêkanîn**

Hevserokê Heyva Sor têkildarî êrişên ku ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ’ê ve li ser xebatkarên Heyva Sor a Kurd hatine pêkanîn wiha got: “Bi dirêjahiya avabûna Heyva Sor a Kurd re gelek caran xebatkarên me yên tendurstiyê û ambulans hatine hedefgirtin û di encamê de xebatkar şehîd ketine û birîndar bûne. Di destpêkê de li Serêkaniyê dema ku endamê me birîndar ji wir dibirin Qamişlo, êrişek li ser ambolansa me hat kirin û 2 endamên me ji aliyê Cebhet Elnesra ve hatin şehîdxistin. Di rizgarkirina ser Girê Sipê de 2 endamên me di encama êrişa DAIŞ’ê de şehîd ketin. Dema ku dewleta Tirk a dagirker êrişî Efrînê kir, mayîn û gule li nêzî ambolansên me diketin, hin caran ambolansên me dihatin hedefgirtin jî û endamên me tê de birîndar dibûn. Piştî wê di êrişa dewlta Tirk a dagirker a li Serêkaniyê de embolansek bi firokên bêmirov hat hedefgirtin û 2 xebatkarên jin hatin şehîdxistin. Li Girê Sipî jî 2 endamê me ji aliyê çeteyên girêdayî dewleta Tirk ve şehîd ketin. Li Kampa Holê jî êriş li ser ekîbê me yên tendurstiyê çêbûne di encama van êrişan de endamekî me şehîd ket. Herî dawî berî du mehan erebeyek ji aliyê firokên bêmirov yên dewleta Tirk ve di navbera Amûdê û Qamişlo de hat hedefgirtin, endamên me ji bo destekdayîna lezgîn çûn bi bîrndaran ve. Lê firokên dewleta Tirk 3 caran êrişî embolansên me kirin. ”

**Xebata ku dike**

Hevserokê Heyva Sor a Kurd Dilgeş Îsa di derbarê kar û xebata ku Heyva Sor dike wiha anî ser ziman: “Heyva Sor a Kurd kar û xebateke mezin û berfireh li tevahiya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dide meşandin. Ji ber ku jîngeh ne saxlem e, gelek nexweşî di nav gel de belav dibin. Bi taybet li kampên koçberan ev yek pir belav e. Lewma jî bi dehan navendên tendurstiyê di hemû kampên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hene û dermanan ji bo nexewşan tê pêşkêşkirin. Herwiha em perwerdeyên hişiyarî, fêrkirina tendurstiyê û çawaniya xilaskririna jiyana mirovan ji mirinê didin civakê. Eger rewşeke awarte weke şewat, şer, nexweşî derkeve, wê demê mirovê perwerdekirî karibe tevbigere. Ji bo dayîna van perwerdeyan jî têkiliya me bi komîn û meclisan re heye û bi riya wan em perwerdeyan didin civakê. Ev perwerde li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên domandin û armanca me ew e ku em bikaribin 2 hezar mirov perwerde bikin. Li aliyekî din navendên tendurstiyên û hem jî navendên rewşên awarte di nav gel de hene di wan navendan de jî hemû alîkariyên pêwîst ji gel tê pêşkêşkirin. Ev kar û xebat, alîkariya ku ji bo gel tên kirin tev bêpere ye, saziyên ku destekê didin me jî ev in UPP a Îtalî û hin rêxistinê girêdayî Hêzên Hevpeymana Navdewletî. Li aliyekî din bi destekdayîna Şaredariyên Ketloniyayê du piroje li ser asta herêmê tevî didin meşandin. Pirojeyek jê ew e ku em çop û bermahiyên tendurstiyê ji çopa normal cuda dikin û dişewitînin, ji bo vê yekê jî gelek şewatgehên taybet li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine avakirin. Armanc ji vê pirojeyê ew e ku nexweşî ji ber van çop û bermahiyên tendurstî çênebin. Pirojeya din jî dîsa bikaranîna çopê û sûdgirtina ji wê çopê, ev piroje tenê li bajarê Hesekê heye. ”



# Warê Zeytûnê bi qirkirina xwezayê re rû bi rû maye

Xwezaya Efrîn ji aliyê Artêşa Tirk ya dagirker û komên çeteyan ve tê talankirin û şewtandin. Ji’23 ê Tîrmehê ve  li Efrînê bi hezaran darên zeytûn û mêweyan ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve hatine şewitandin. Tevî ku qirkirina xwezayê li gorî peymana navneteweyî ya Cinêv û Romayê sûcekî dijmirovî ye jî, lê tevahiya cîhanê bêdeng e

**Navenda Nûçeyan**

Herêma Efrînê di Rojavayê Kurdistanê de herêma herî zêde ku bi xweza, dar û daristanên xwe tê naskirin. Efrîn di çandina darên zeytûn û berhemên wê de li ser asta cîhanê tê naskirin û gelek navdare, di Sûriyê de yek ji jêderên bingehîn yê hilbirîna zeytê bû. Li Efrîn beriya dagirkeriyê  zêdetirî 18 milyon darên zeytûnan hebûn. Her wiha rûbera Efrînê 3 hezar û 850 km2, piraniya wê deverên çiyayî ne û deverên daristanî jî zêdetirî  ji sedî 11 ji rûbera wê pêk tîne.

**Qirkirina Xwezayî tê kirin**

Efrîna ku bi xweza û rengê xwe yê kesk dihate naskirin, piştî dagirkeriya  ku di 18’ê  Adara 2018’an de pêk hatiye, veguherî navenda tundî, işkence, talankirin, dizî, revandin û kuştinê.

Ji bilî komkujiyên ku derheqê gelê Kurd û jinên Kurd di Efrînê de pêk tên, dagirkeriya Tirk û komên çeteyan dest bi talankirina xweza, sererd û binerda wê kirin. Bi hezaran dar û daristanên Efrînê hatin şewitandin. Bi taybet bi hezaran darên zeytûnê hatin birîn û li ser wê bazarên kirîn û firotinê di herêmên di bin dagirkeriya Tirkiyê de hatin kirin.

Di vê çarçoveyê de bi taybet mal û milkên hemwelatiyên ku ji Efrînê koçber bûne, bi hemû rengê hovîtiyê hatin desteserkirin. Û piraniya darên wan hatin qutkirin û hilkirin.

**Zêdetirî 21 milyon dar hatine qutkirin**

Li gorî raporan ji destpêka dagirkerina Efrînê  û heta niha zêdetirî 500 hezar darên zeytûnan û 21 milyon darên daristanan htine qutkirin. Ji darên zeytûnan ku hatine qutkirin 280 hezar darên  ku temenê hinek ji wan zêdetirî 60 salî ne. Ev amara jî ji aliyê rêxistinên pêwendîdar ve jî hatine belgekirin û ji bo raya giştî hatiye pêşkêşkirin.

Di rojên borî de (23-24-25) Tîrmeha 2024 an, agir bi rûberên berfireh ji daristanên xwezayî yên çiyayên di navbera deştên gundê “Adma” û bajarokê “Meydan Akbes ket. Ji gundên “Alabisk û Bilîlko” re derbas dibe, hetanî rêya ku diçe gundên “Maydana” li bakur, û çiyayê “Jala” li başûr ku bi 230 hektar tê texmînkirin û li derdora wê bi hezaran darên zeytûn, kerez,



hêjîr û tirî hene, li navçeya Racû, li ber çavê dewleta Tirk a dagirker û komên çekdar ên girêdayî wê ku ti tiştek ji bo vemirandina wî agirî nekirin, ji bilî hewldanên mutewazî, û tîmên Berevaniya Sivîl.

Rêxistina Mafê Mirovan Sûriye-Efrîn derbarê birîna daran herî dawî wiha got: “Di çarçoveya birînên vê dawiyê de, hejmarek ji kesên ku tawanên birîna daran dikin, nêzîkî hefteyekê berî niha li cihekî li başûrê bajarokê Qetma - navçeya Şara, 45 darên zeytûnan bi qismî birîn  û darên ku hatine birîn aîdî welatiyên Kurd in ku ew herêm di bin serweriya Cebha El Şamiyê de ye. Komên çeteyan bi şev bi amûrên birînê yên elektrîkê dar dibirîn û veguhestina daran bi otomobîlên barhilgir li ber çavên bendên komên çeteyan dihat kirin. Li hemberî vê yekê malbatên ku darên wan hatine qutkirin, şîkayet li gel polîsên bajêr kirin, lê ev yek bê encam bû. Hêjayî gotinê ye ku beriya niha bi du hefteyan nêzî 200 dar yê xelkê Qitmê hatin qutkirin û heta niha jî birîna neheq li wê deverê berdewam e.

Di çarçoveya şewitandina daristanan de, 30’ê Tîrmehê, agir bi daristanên di navbera gundên “Çiyê û Afrazê” yên gundewarên Efrînê ket. Piştî destwerdana tîmên parastina sivîl /Xuz El Bayda/ agir hate vemirandin.

Her wiha li gorî ku Rêxistina Mafê Mirovan daye destnîşan kirin ku li Efrînê cihên pîşesazî yên komirê ku ji aliyê bazirgan û serokên komên çete ve tên birêvebirin, wiha ne:

- Di navbera gundên Kamruk û Sêmalka, navçeya Mabata.
- Gundên Meydana, navçeya Raco.
- Gundê Hesen, navçeya Raco.
- Gundê Komreşê, navçeya Raco.
- Di navbera gundên “Cerqa – Alamdara” – navçeya Raco.

**`Dagirkeriya Tirk hemû bendên peymanên navnetewî yên Cenev û Romayê binpê dike`**

Pêkanîn û kiryarên dagirkeriya Tirk yên ku di Efrîn û herêmên dagirkirî de dike, êdî gihîştine lûtkeya binpêkirinên mafê mirovî û sîwanên sûcên şer derbas kiriye. Kiryarên dagirkeriya TirK yên di derheqê gel û herêmên Kurdan de pêk tîne, herî dawî bi belge û tesbît ji aliyê Rêxistina ‘Human Rights Watch’ ji raya giştî re hate pêşkêşkirin. Dagirkeriya Tirk di herêmên dagirkirî de hemû pêvanên mirovî derbas dike her wiha zagon û peymanên navnetewî binpê dike.

Ev kiryarên Tirkiyê li gorî Madeya (8) ya Sûcên Şer ji Qanûna Romayê ya Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî û Binpêkirinên giran ên Peymana Cenevê ya 12 Tebax 1949’an, sûceên dijmirovî ne.


# ‘Divê sendîqayên rojnamevaniyê xwedî helwestên bi bandor bin’

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Rojnamevan Ehmed Umer da zanîn ku Silêman Ehmed bi tawanekî ji rastiyê dûr hat cezakirin. Herwiha Umer diyar kir ku heta rojnamevan Silêman Ehmed were azadkirin û rê li pêşiya kiryarên PDK’ê de were girtin, pêwîste Sendîqeyên Rojnamevaniyê, Navenda Metro û gelên Başûrê Kurdistanê xwedî helwestên bi bandor bin.**

Piştî 279 rojan ji revandina edîtorê beşa erebî ya Ajansa Rojnewsê Silêman Ehmed, PDK’ê biryar da ku 3 salan Ehmed were darzadnin. Hêjayî bi bîrxistinê ye ku Silêman Ehmed di 25’ê Cotmehê de, li deriyê Sêmalka ji aliyê PDK’ê ve hat revandin. Piştî revandina wî bi çend rojan asayîşa PDK’ê ya Dihokê bi daxuyaniyekê ragehand ku wan Silêman Ehmed revandiye. Wekî tê zanîn bi dirêjahiya vê dîrokê PDK’ê tenê carekê hişt ku parêzer hevdîtinê bi wî re çêbikin. Herwî dawî bi tewanên derw PDK’ê 3 sal hikumê darzandinê li rojnamevan Silêman Ehmed birî.

Têkildarî heman mijaran jî



pêşkêşvanê Rojava TV ji rojnameya me re axivî.

**‘Rojnamevan kiryarên PDK’ê eşkere dikin,  lewma tên girtin’**

Ehmed da zanîn ku rojnamevan ji ber diyarkirina kiriyarên PDK’ê yên qirêj tên dîlgirtin û wiha got: “ Ev demeke dirêj e ku gelek çalakvan, rojnamevanên û kesên azadîxwaz ku serbixwe li Başûrê Kurdistanê kar dikin ji aliyê PDK’ê ve rastî zext û astengiyan tên. Bi taybet saziyên raghandinê yên ku serbixwe siyastmedar û çalakvanên ku dixwazin guhertinê li Başûrê Kurdistanê çêbikin û rewşa kesên ku kiryarên derzagonî ji aliyê PDK’ê ve li ser wan tên kirin, diyar bikin. Bêhtirî xwe rojnamevan siyaset, hevkariya bi dijmin re û kiryarên ku PDK’ê li Başûrê Kurdistanê dike didin eşkerekirin. Lewma tiştek ji destê PDK’ê nayê kirin ji bilî revandin û dîlgirtina rojnamevanan. Bi vî rengî PDK’ê siyaseteke wisa li hemberî her kesê ku dixwaze rastiyê ji bo raya giştî derxîne, dide meşandin. Mînaka vê siyasetê jî, girtina rojnamevan Silêman Ehmed û gelek rojnamevanên din, herwiha çalakvanên din e. ”

**‘Madeya ku Silêman Ehmed pê hat darzadin, bê bingeh e’**

Umer diyar kir ku rojnamevan Silêman Ehmed bi sûcekî ku bingaha rastiyê jê re tune ye hat cezakirin û wisa domand: “Wekî em dizanin piştî bêtirî 7 mehan ji revandina Silêman Ehmed, 3 sal cezayê darzandinê ji bo wî hat birîn. Piştî dirêjahiya vê demê PDK’ê bi hincetê derw ew bi sûcekî dûrî rastiyê dadgeh kir. Hikumta Başûrê Kurdistanê di sala 2007’an de madeya 35 derxist, ev made dest nîşan dike ku ji mafê rojnamevanê zererê bighîne sîstema Başûrê Kurdistanê û tiştekî dûrî rastiyê belav bike, bi vê madeyê û yasayên rojnamevaniyê were dadgehkirin. Lê dadgehkirin û cezayê ku li ser hat darzandin ne wiha bû, ew ceza derqanûnî bû. Di heman demê de PDK’ê bi hinceta ku rojnamevan Silêman endamê PYD’ê ye ev hukim lê birî, wekî em dizanin li gor zagonên rojnamevaniyê, ji mafê rojnamevanan e ku girêdayî aliyekî siyasî be. Lê heta hinceta ku endamê PYD’ê ye jî ne di cihê xwe de bû û ne rast bû, me dît ku PYD’ê ev hincet bi daxuyaniyekê red kir û da zanîn ku ti têkiliya Silêman Ehmed bi PYD’ê re tune ye û ew ne endamê wê ye. Di dema heyî de divê PDK’ê baş li vê biryara darzandina rojnamevan Ehmed û kiryarên dijî rojnamevaniya azad vegere. Ji ber ku heger kiryarên bi vî rengî li Başûrê Kurdistanê bidomin wê asta raghandina azad ber bi jêr ve biçe û namîne. ”

**‘Pêwîste sendîqeyên rojnamevaniyê tevger û helwestê xurtir bikin’**

Pêşkêşvanê Rojava TV Ehmed Umer anî ser ziman ku divê sendîqeyên rojnamevaniyê yên Başûrê Kurdistanê û her mirovekî azadîxwaz ji bo azadkirina Silêman Ehmed û gelek rojnamevanên din helwesta xwe bi hêztir bike û wiha axivî: “Piştî hukmê darzandinê li ser rojnamevan Silêman Ehmed hat standin, me dît ku gelek navendên parastina mafê rojnamevanan  yên Başûrê Kurdistanê bertek û nerazîbûn ji bo darzandinê dan. Ev navend jî li ser asta navdewletî weke Navenda Metro û Sandîqeyên Rojnamevanan yên Başûrê Kurdistanê. Di dema ku  Silêman Ehmed hat revandin de jî Navenda Metro daxuyanî da û bandorek li raya giştî ya cîhanî kir. Ne ji van hewldanên Mitro û Sandîqayên rojnamevaniyê bûya wê PDK’ê Silêman Ehmed jî dadgeh li dar nexistibaya. Helwesta van navendan ji bo darzandina Silêman Ehmed heya radeyekê baş bû, lê divê di asta navdewletî de helwestên cidî û bi bandor derxînin ji raya giştî re. Ango heta Silêman Ehmed û rojnamevanên din yên ku bêsûc hatine dîlgirtin, azad bibin û rê li pêşiya kiryarên PDK’ê yên wiha bê girtin pêwîste sendîqeyên rojnamevaniyê û gelên azadîxwaz yên Başûrê Kurdistanê destekê bidin rojnamevanan.”

# Dîroka PDK’ê a reş; Li Başûrê Kurdistanê

Ji dîrokê ve û heta niha, herdem PDK’ê bi xiyanet û rûreşiyê cihê xwe di nava rûpelên wê de girtiye. PDK’ê di sala 1992’an de li hember xeta Jina azad û berxwedêr a Şehîd Bêrîtan, xiyaneta xwe eşkere kir. Herwiha her ku xeta têkoşînê mezin bû, PDK’ê jî xiyaneta xwe mezin kir.

**Amara Baran / Qamişlo**

Mirov bala xwe bidiyê wê were dîtin, dema ku serhildan bi hêzên leşkerî nehatiye têkbirin îxanet ketiye dewrê. Sefera dawîn bi êrişa îxanetê re tê kirin. Di vê pêvajoyê de PDK’ê dikeve dewrê. Ji ber vê Erdogan dibêje ‘Em hatin dawiyê, em ê îsal terorê biqedînin, ji ber vê em hemû hêza xwe û derfetên xwe dixin dewrê. Heke wê dostên me, hêzên herêmî, NATO ew ê alîkariyê bidin me, a niha dema wê ye. Ji ber ku me êrişeke topyekun daye destpêkirin.”

Erdogan dema qala ‘hêzên herêmî’ dike bêguman qesta wê PDK ye. Wisa gotiye “Dostaniya me ya bi Nêçîrvan Barzanî ji bo me gelekî cihê ye û hiqûqa di navbera me de di asteke pêş de ye. Di her warî de fikra me wekî hev e. Wî jî got ku wê di vê meseleyê de tişta ku ji destê wî tê bike.” Ev ne dîplomasî û ne jî têkiliyeke normal e. Ev daxuyanî tê wateya ku di konsepta tasfiyekirina Tevgera Azadiyê de mîsyona ku Erdogan daye PDK’ê. Bila tu kes bi awayekî din şîrove neke û wekî têkiliyeke dîplomasiyê nenirxîne! Hêzên navneteweyî yên ku ji bîrdoziya PKK’ê aciz in, mîsyona şerê li hemberî Tevgera Azadiyê dane malbata Barzaniyan. Bila tu kes vî tiştî înkar neke û bi awayekî din şîrove neke.

**Şerê Xiyanetê yê Sala 1992**

Şerê sala 1992‘an ku PDK û YNK bi hevkariya artêşa tirk li dijî PKK kirin, divê bi îxanetê bê hejmartin. Wê demê PDK û YNK gotibûn em ê PKK’ê li Başûr ji nav bibin û Turkiye jî statuya federalî qebûl dike. Bi vê awayî hikûmet û perleman hat pejirandin; ew jî dîsa bi sedema xebata PKK’ê li Başûr bû. Lewma hikûmet û perleman ava bû û biryar jî hat girtin li dijî PKK’ê şer bikin. PKK’ê tenê bû û hêza wê jî li hember wan hêzan zêde nebû. Li gorî nêrîna PDK’ê ku ji gel û pêşmergeyên xwe re dikir, digot “beşek ji wan (PKK) zarok in û beşek din jî jin in, tenê bi destan em ê wana bigrin, her kes têra xwe tiştan bike û jinê wan jî ji xwe re bibin.” Piştî ku PKK’ê eniya PDK’ê têkbir, dewleta tirk jî ev dît ku bi têkçûna PDK’ê riya Zaxo vedibe û eger destêwerdan nake, kar ji kar derdikeve. Turkiye heya wê demê ev hesab dikir ku PDK û YNK’ê êriş tînin ser PKK û eger birevin û nêzê sînor bibin, wan jî wê li hemberê gerîla bikevin nave şer. Lewre navê vê operasyonê kiribûn “Tevgera Sendiwîç!” sedî sed jî baweriya wan hebû ku wê encam bigrin. Turkiye ji her milî ve wan amadekiribûn, ji çek û teqemenî ve bigre, heta hinek tîmên taybet bi cilê pêşmergeyan pê re bûn. Di rastiyê de Tirkiye şer bi rê ve dibir û bi helîkopter, top û balafir jî ji Bakur û Başûr ve êriş kir. Êdî dema dîtin Zaxo ketiye ber metirsiyê, pêbaweriya Turkiye bi PDK û YNK’ê nema û wan bi xwe destêwerdan kir.

**Yê Ku PDK’ê Cihbicih Kir Siyaseta Giladyo Bû**

Di sala 1997’an de çendîn tevgerên dagîrkerî yên berfireh ji aliyê artêşa tirk û PDK’ê ve li dijî gerîla hat kirin ku destpêk di meha Gulanê de, herêma Zapê girt nava xwe, lê piştre di mehên dawiya salê, ev tevgera dagîrkerî herêmê din jî girt nava xwe û bû serdema rûdana şerên pir giran. Di 14’ê Gûlana sala 1997’an de ji bo kontrolkirina herêma Zapê operasyon dest pê kir. PDK’ê girê “Kurêjehro” girtibû û ji wir ve piştevanî dikir. Pîlanekî wiha hebû ku armanca wê tenê bêbandorkirina baregeha sereke û di encamê de bidestxistina herêma Zapê bû. Di lîteratura artêşa tirk de jê re digotin “Belavkirina Sîstema Fermander”. Tevahî hêzên hewayî bikar anîn û ji ber westîna hêzên PKK’ê di mehên berê de, gerîla ji herêmên din paş ve kişiya. Lê piştî wê û dema ku gerîla bi fuzeyan li helîkopterekî dan ku fermandarên şer tê de bûn. Lewma operasyon têk çû û bi pîskolojiyekî xirab bi lez paş ve kişiyan.

**PDK, Civîna Ûrdûn û Ragihandina DAIŞ’ê**

Li Kurdistanê PDK’ê bi alîgirê suniyan tê naskirin û têkiliya wî bi Erebistana Seûdî, Kûweyt û Misir ji serdema Mela Mistefa re vedigere. Di serdema Mesûd Barzanî jî ev têkilî berfirehtir bû û Turkiye jî li ser zêde bû. Şerê ku Barzanî li hember Caferî, Malikî û piştre Ebadî kir, bi wekalet bû ji bo Turkiye, Erebistana Seûdî û Emerîka. Hêzên tundajoyên kurd mîna Ensarolîslama Mela Kirêkar, Tewhîdî û Condiyan. Her wiha beşek ji kadroyên nava Bizûtnewey Îslamî û Komelê Îslamî ku li Efganistan rahênan dîtibûn, ji ber hebûna PKK’ê, derfet nemabû li çiyayan xwe veşêrin, li derfetekê digeriyan ji bo careke din werin meydanê. Di derketina DAIŞ’ê de hemû wan hêz û dewletên ku li jor amaje bi wan hat kirin, xwedî rol bûn. Piranî wan aliyan jî di civîna Ûrdûnê di meha Pûşbera 2014’an de amade bûn ku tê de (DAIŞ) hat ragihandin.



Di destpêkê de DAIŞ bi eniya El-Nusra re bû û piştre bi perspektîfên El-Qaîde re tev digeriya û di demekê kin de bi serê xwe bi navê DAIŞ’ê Pêşnûme û naveroka civîna Ûrdûn ji aliyê Îran ve hat eşkerekirin û bi vî rengî, hemû aliyên ku tevlî bibûn eşkere bû. Her çend ku PDK’ê tevlîbûna xwe ji wê cvînê re inkar dike, lê ew jî têde amedebû. Lê di heman dîrokê de, serok û sekretera PDK’ê û kurê mezinê wî li Ûrdûn bûne. Li gorî wan belgeyan, Mesrur Barzanî û sekretera PDK’ê, Fazil Mîranî tevlî civînê bûne. Gotinekî Mesûd Barzanî ji Malikî re hebû ku gotibû “ezê belayekî bînim ser te, navê xwe ji bîr bikî!”, her wiha dema DAIŞ Mûsil dagir kir, dîsa li parlemanê gotibû “ji niha û şûn ve cîranekî me ya nû heye û dê bi wan re danûstandin bikin “ Têkiliya RûdawTV bi berdevkê DAIŞ û nebirîna xetê mobilê KOREK û valakirina Şengal bê ku fîşekekê jî bê teqandin jî dikeve heman çarçovê. Her wiha serokê PDK’ê şerê çeteyan li dijî hêzên 157 şoreşger a Rojava bi rewa dihesiband. Yek ji kiryarên din ê qirêj, çêkirina Xendeqan di navbera Başûr û Rojavayê Kurdistanê ji bo ku gelê Rojavayê Kurdistan di dema tengavbûnê de derbasî Başûr nebin.

Ji sala 2003’an û vir ve derfeta PDK di her qadê de zêdetir bû ku an pirsgirêkan kêm bike û Başûrê Kurdistan geşe bike an jî weke her hêzekî din ku deshilatê digre dest, destpêk ê ji xwe re bifikre û piştre jî bi rengekî şeklî, hinekî bi civakê re mijûl dibe. Lê mixabin yê ku PDK’ê nişan da, ji her desthilatekî din ji bo kurd û civaka Kurdistan xirabtir bû. Pirsgirêkên siyasî, civakî, çandî, ekoloji û hemü qadên ku têkildarê civakê ne, naveroka qeyranê bi xwe girtin û niha Başûrê Kurdistan di lûtkeya qeyranan de dijî.

**Dewleta tirk PDK’ê wek hespê Tirûvayê bikartîne**

Dewleta Tirk û hêzên navneteweyî dixwazin bi destê malbata Barzanî tevgera azadiyê tasfiye bikin. Wekî di serhildanên berê yên Kurdan de di vê serhildanê de jî îxanetê dixin dewrê. Malbata Barzanî wekî hespê Trûvayê bi kar tînin û dixwazin xeta Tevgera Azadiyê û Rêbertiya wê tasfiye bikin. Divê êdî her kes vî tiştî bibîne û wisa fêm bike. Bila nebêje ‘PDK Kurd e, pêşmergeyên wan heye, ji bo Kurdan têkoşîn hatiye kirin û ji ber wê îxanetê nake’.Rayber jî Qasim jî û Êzdinşêr jî Kurd bûn. Malbata Barzanî ne bi tenê êrişî Tevgera Azadiyê kirine û gerîla qetil kirine. Malbata Barzanî Saît qetil kirine, gelek fermandarên Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê înfaz kirine, di şerê li hemberî YNK’ê de bi hezaran şervan qetil kirine.

Bi kurtasî, dewleta Tirk a ku hêza wê kêm bûye, malbata Barzanî wekî hespê Trûvayê bi kar tîne û dixwaze encamekê bi dest bixe. Lê Kurd ne Kurdên berê ne. Gelê Kurd rastiyeke gel a polîtîk bi dest xistine. Gerîlayên ku li hemberî dagirkerî û îxaneta li ser Zap, Metîna û Avaşînê li ber xwe didin, wê îxanetê jî têk bibin. Wê careke din dewleta Tirk a ku dijminatiya gelê Kurd dike wê bi îxanetê bi ser nekeve, wê gerîla demarê îxanetê ji Kurdistanê bavêje.

**PDK’ê bi qetikirina ciwanan hovîtiya xwe dide ispatkirin**

Vaye îro dîsa PDK’ê bi qetilkirina ciwanên gelê xwe, hovîtiya xwe ji dagirkeran re dide isbat kirin. Bi qetilkirina Endamê Ofîsa KNK’ê Denîz Cevdet Bulbun pir zelal dide diyar kirin ku erkê xwe ji bo dewleta faşîst a Tirk pêk tîne. Em ji bîr nekin armanca serdana Hakan Fîdan a ji bo malbata Barzanî ev bû ku erkê KDP’ê bîne bîra wî, ji bo ku îxaneta xwe bi her awayi bê qisûr dewam bike. Piştî serdana Hakan Fîdan a li Başûrê Kurdistanê, êrîşê li ser her çar parçeyên Kurdistanê zêdetir bûn û bi taybetî li ser pêşengên gelê Kurd. Hemû jî bi desteka mala Barzanî ev êrîş pêk tên û heta ew bi xwe jî destûra êrîşan dide ku li ser xaka Başûrê Kurdistanê çêbibin. Eger gelê Kurd, Kurdistan û Yekîtiya Neteweyan ji bo mala Berzanî armanc bûya, niha li seranserî cîhanê gelê Kurd û Kurdistan xwedî statu bûn.

Divê her kesên ku ji bo nasnameya Kurdbûnê û Kurdistanê têkoşîn dike, bi helwesta xwe kiryarên ku bi destê malbata Barzanî hatine kirin, lêpirsîn bikin û PDK’ê vexwînin meydana hesab xwestinê. Êdî tu hincet nemaye ku PDK’ê rûreşiya xwe veşêre û di bin navê Kurdbûnê de tenê xizmeta berjewendiyên xwe bike. Pêwîste êdî PDK’ê wek partiyekê Kurd neyê dîtin. Divê destûra vê yekê jî neyê dayin ku pir bi rihetî dagirkeriya Tirk li Başûrê Kurdistanê xwe bi cih bike û hemû gelên ku li Başûrê Kurdistanê û Iraqê jiyan dikin nehêlin ku PDK’ê qedera wan bixe destê hêzên dagirker. Bila hemû gelê Başûrê Kurdistanê vê yekê baş bizanibe ku bi yekbûna netewî, wê cih ji desthilatdar û dagirkeran re li ser xaka Kurdistanê nemîne. Li hember her kiryarên mala berzanî çalakiyên radîkal pêwîstin. Li hember her êrîşekê xwedî li destkeftiyên xwe û gelê xwe derketin, ev helwest bi tena serê xwe dibe bersivek ji bo îxaneta malbata Barzanî. Wê demê êdî PDK’ê wê nikaribê bi dilxweşî hevkariya bi hêzên dagirker re qebûl bike.



# Fermana 3 Tebaxê dewama qirkirina gelê Kurd e

Di 3’yê Tebaxa 2014’an de, bi armanca qirkirina civaka Êzidî, çeteyên DAIŞ’ê bi çekên giran berê xwe dan Şengalê, li ser xaka wê ya pîroz komkujiyên mezin pêk anîn û bi hezaran jin û zarokên Êzidî revandin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Roja 3`yê Tebaxa 2014`an de çeteyên DAIŞ’ê bi çekên giran êrişî herêma Şengalê kirin û dagir kirin, çeteyan komkujiyek pêk anîn û nêzî 5 hezar jin û zarok revandin. Dema ku çeteyan êriş kirin pêşmergeyên PDK’ê li ser fermana rayedarên xwe çeperên xwe berdan, çawa artêşa Iraqê bajarê Mûsilê ji çeteyan re berda. Artêşa Iraqê hêzên xwe ji bajarê Mûsilê kişandin û bajar radestî çeteyên DAIŞ’ê kirin, paşê DAIŞ‘ê berê xwe da bajarê Telaferê ku şêniyên wî Tirkmen û Şîa ne û wir jî dagir kir. Tirkmenên Telaferê ji bajar reviyan û berê xwe dan Şengalê, welatiyên Şengalê jî deriyên xwe ji wan re vekirin û parastin. Lê paşê Hikûmeta Iraqê Tirkmen û Şîayên xeta Dihok û Hewlêrê bi balefiran veguhestin bajarên Necef, Kerbela û Bexdayê.

**Nîşanên êrîşa li dijî Şengalê**

Çeteyên DAIŞ`ê navçeya Bilic a başûr rojavayê Şengalê ku şêniyên wê Erebin dagir kirin, piştî çend rojan navçeyeke din a li başûrê Şengalê jî dagir kirin, ji xwe wê çaxê herêma di navbera Şengal û Sûriyê de di bin destê DAIŞ’ê de bû, bi vî awayî başûrê Şengalê bi tevahî kete bin kontrola çeteyên DAIŞ`ê. Her wiha li rojhilatê Şengalê bajarê Telaferê bi bin destên DAIŞ`ê de bû, DAIŞ‘ê di demeke kin de navçeya Zumarê jî dagir kir, lê paşê YPG’ê û pêşmergeyên YNK’ê beşekî vê navçeyê rizgar kirin.

Bajarokê Rebîa yê li hemberî bajarokê Til Koçerê yê Rojava herêmeke stratejîk bû, rojhijatî wê di bin kontrola YPG’ê de bû û rojavayê wê jî di bin kontrola DAIŞ’ê de bû. Beriya ku DAIŞ êrişî Şengalê bike xwest ku herêma Şengalê ji hemû aliyan ve dorpêç bike, lê şervanên YPG’ê beriya wê bajarokê Rebîa û paşê jî Ceza xistin bin kontrola xwe û plana DAIŞ’ê ya dorpêçkirina Şengalê vala derxistin.

**Rewşa ewlekarî li Şengalê beriya êrişê**

Li Şengalê du hêzên leşkerî hebûn, artêşa Iraqê û hêzên ewlekariya Iraqê û hêzên pêşmergeyên PDK’ê. Dema ku Tirkmen û Şîa reviyan Şengalê çeteyan çend caran êrişî bajarê Şengalê kirin. Şengaliyan jî kar û barên parastina xwe kirin û çeperên xwe kolan, şêniyên gundan jî li dora gundên xwe çeper çê kirin û bi şev û roj nobet digirtin. Her ku êrişek pêk dihat hêzên pêşmergeyan dihatin cihê êrişê çend gule berdidan û paşê vedigeriyan baregehên xwe.



Wê çaxê welatiyên Şengalê dixwestin li dijî DAIŞ’ê şer bikin, lê pêşmergeyan “digotin eger hûn bersiv bidin wê DAIŞ gundê we bombebaran bike, bi van gotinan welatî dihatin xapadin. Her wiha dema ku welatiyan ji bo parastina xwe çekên giran dixwestin çek nedidan. Dema ku leşkerên artêşa Iraqê Şengal berdan çekên xwe li şûn xwe hiştin, welatiyan dest danîn ser van çekan lê pêşmergeyan careke din ew çek ji destê welatiyan derxistin.

**PDK’ê beşdarî civîneke veşartî bû**

Li gorî agahiyên wê demê roja 1’ê Hezêranê li paytexta Urdun Umanê civîneke veşartî hatibû li darxistin. Di civînê de nûnerê Emerîka, Israîl, Erebistana Sûdî, Tirkiyê û PDK’ê beşdar bûn. Tê gotin ku plana êrişa Mûsilê di vê civînê de hatiye standin, ji xwe piştî 7 roja êriş destpê kir.

Beriya êrişa Şengalê jî di navebera PDK’ê û Tirkiyê de civînek hatibû lidarxistin, paşê pêşmergeyên PDK’ê ji Şengalê vekişiyan û deriyên Şengalê ji DAIŞ’ê re vekirin.

**Şeva êrşiê**

Derdora saat 3 berê sibehê êriş destpêkir, çeteyan gundê Girzerkê topbaran kir û pevçûnên dijwar li wir qewimîn, piştî nîv satê çeteyan êrişî gundê Sîba Şêx Xidir kirin. Welatiyan liberxwe dan, lê ji ber ku çekên wan kêm bûn welatiyan xwe paş de kişand. Paşê çeteyan êrişî gundên Rambosê, Tilqesab, Koço û Tilbinadê jî kirin, çekên giran bikar anîn. Derdora sat 6 êvarê gelek birîndar gihiştin nexweşxaneya bajarê Şengalê.

Di heman demê de hêzên pêşmergeyan kar û barê vekişînê kirin, maşînên wan di bin parastina çekên giran de ji herêmê vekişîn bêyî ku welatiyan agahdar bikin ji herêm vekişiyan. Welatiyên ku heta wê çaxê li dijî çeteyan li ber xwe didan, piştî ku bihêzên pêşmerge vekişiyan bê moral ketin. Welatiyên ku maşînên wan hebûn jin û zarokên xwe birin û derketin, yên ku maşînên wan tune bûn bi meşê berê xwe dane çiyayên Şengalê. Welatiyên ji bajêr direvîn tenê gotinek dihat ser zimanê wan, ew jî ”pêşmergeyan me firotin”. Sat 10 `an çeteyên DAIŞ`ê bi hêsanî ketin bajarê Şengalê. Di sat 11`an de dengê teqîneke mezin hate bihîstin, çeteyan mezarê Seyde Zeyneb a Şîiyan teqandin. Di heman demê de bi deh hezaran Şengalî ber bi çiyê ve bi rê ketibûn.

**Meşa mirinê**

Welatiyên ku bi maşîneyan û yên ku bi meşê jî derketin berê xwe dane çiyanên Şengalê. Rêyên rojhilat û rojavayê bajêr girtî bûn, ji xwe kesê ew rê bi kar nedianî, welatiyan jî berê dane rêyên çiyayên Şengalê ji ber ew rê bi ewle bûn. Rê ji mirovan hatibû dagirtin û rêya çûyinê zehmet bû. Ji ber birçîbûn û tîbûnê welatî 12 saatan diman ta ku digihiştin çiyê. Rewşa zarokan gelek aloz bû, ji birçîn û tîna digrîn, pîr û kal jî nedikarîn bimeşin, ciwanan bi firaxan av ji kal û zarokan re tanîn. Bi sedan zarok di rê de mirin û li çiyê di bin keviran de hatin defin kirin.

Çeteyan çiyanên Şengalê dorpêç kirin û xwestin rê li welatiyên qut bikin. Welatiyên ku li ber mirinê man tenê hêviyeke wan hebû, ew jî komek gerilla ku beriya êrîşê berê xwe dabûn çiyayên Şengalê û erdnîgariya wê naskiribûn. Koma şervanan beriya ku DAIŞ xwe bigihîne çiyanê Şengalê cihê xwe girtin û rêya derbasbûnê çiyê parastin û nehiştin ku çete ber bi çiyê ve pêş bikevin û bi vî awayî bi hezara Êzîdî ji mirinê xilas kirin.

**Korîdora mirovahiyê**

Di vê navberê de şervanên YPG’ê û YPJ’ê ji bo vekirina korîdorekê di navbera Rojava û Şengalê de dest bi operasyoneke leşkerî kirin. Armanc ew bû ku bi sedhezaran Êzîdiyan ji mirinê xilas bikin. Di encama operasyonê de korîdor hate vekirin û bi deh hezaran Êzîdiyên Şengalê ku asê mabûn derbasî roja hatin kirin.

Piştî vekirina korîdorê bi hezaran Şengaliyan berê xwe dan Rojava, di vê navberê de bi hezaran welatiyên kantona Cizîrê jî ji bo pêşwazîkirina Şengaliyan di nava seferberiyê de bûn, welatiyan bi maşînên xwe Şengalî veguhestin kampa Newroz a li herêma Dêrikê, her wiha li ber sînor av û xwarin ji koçberan re amade kirin.

**Avakirina Yekîneyên Berxwedana Şengalê**

Piştî komkujiya Şengalê û piştî ku pêşmerge reviyan û Êzîdî di nava destên DAIŞ’ê de hiştin, welatiyên Şengalê naskirin ku pêwîste hêza xwe ya parastinê ava bikin da ku karibin li kêleka gerilayan Şengalê rizgar bikin û biparêzin. Di 4’ê tebaxa 2014’an de Yekîneyên Berxwedana Şengalê bi awayekî fermî hate ragihandin û ji wê rojê de li kêleka HPG’ê, YJA’ê-STAR ji bo rizgarkirina Şengalê ji çeteyên DAIŞ’ê şer bike. Piştî wê 11 çileya 2015’an jî hêza leşkeriya ya jinên Êzîdî bi navê YPJ-Şengal hate avakirin.

**Meclisa avakar a Êzîdiyên Şengalê**

Roja 14’ê meha Çile 2015 nûnerên gelê Êzîdî di civînekê de damezrandina Meclisa avakar a Êzîdiyên Şengalê ragihandin. Li gorî rayedarên meclisê yek ji sedemên ku DAIŞ kete Şengalê ji ber ku Êzîdî bê rêxistin û bê parastin bûn lewma pêwîst dîtin ku vê meclisê ava bikin. Berdevkê Meclisê Xidir Salih diyar ku meclisa wan bi îradeya gelê êzîdî hatiye damezrandin û armanca wan birêxistinkirina gelê êzîdî û pêşî lêgirtina komkujiyan e.

**FENER**



**Berxwedana Gerîla Misogeriya Pirrengî, Azadî Û Demokrasiyê Ye**

**Idrîs Henan**

Dewletan Tirk a dagirker bi van nêzîkatî, azwerî û xeyalên xwe yên kiritandin, parçekirin û desteserkirinê, hewl dide herêma Rojhilata Navîn veguherîne dagirstaneke mezin a dirindeyî ku mezin biçûkan daqurtînin. Ango; bi xirakirina dengeya xwezayî ya herikîna jiyanê, nepixandina netewperestiya radîkal, nijadperestî û xeyalên xwe yên millî re, dixwaze hêza xwe ya destwerdana bêserûber ferz bike û her dera hêvî dike jî dagir û îlhaq bike. Lew re jî her di nava bê ewlehiyê de xwe hîs dike û wisa jî hewl dide derdorê iqna bike ku kirêtî û dagirkeriyên xwe rewa bike.

Bê guman; paş perdeya van daxwazên faşîzma Tirk “Osmaniya Nû” heye. Ew yek jî li ser bingeha xwepêşandana hêza serweriyê ya dîroka wê ya imperial xwe dide rûnişkandin. Aliyek wê yê din jî “Kemalîzm” heye. Ew jî li ser bingeha neteweperestiya xwe spartiya qirkirina netewa Kurd hatiye rûnişkandin.

Di siyasetên faşîzma Tirk ên derve de, Osmaniya Nû bûye hêza cinerator û di vê xalê de bi saziyên neteweperest ên leasîzma nijadperestiya Tirk re li ser bingeha dijatiya ji Kurdan re hemfikir in. Lew re dijatiya rojava dikin û hewl didin bi DYE û Birûksilê re li hev bikin. Herdû jî bi heman stratejiyê hez dikin ku têkîliyan bi Şam, Bexda û Tehranê re baştir bikin. Ji xwe vê têkîliya mijara gotinê, weke binyada berfirehkirina serweriya Tirk li herêmê dibînin ku şertekî tunekirin û qirkirina gelê Kurd û têkoşîna wî ya azadiyê ye. Faşîzma Tirk fonksyoneke têkel ê wisa ye ku bi serperştiya pîskopatekî fena Erdogan û hinek egoîstên paramîlîter ên ji bermahiyên piyaseya global a xwefirotin û kepirnizimiyê hatine strandin, ji bona ewlehî û istiqrara li herêmê veguheriya çavkanî û jêdera metirsiyê. Îroj bi vê zihniyeta kolonyal, mêtinger û siyasetên kiritandin û îxlalkirina bi hêza leşkerî li dijî gel û welatên herêmê, li gel çete, xayîn û hevkarên xwe êriş dikin û aramiya herêmê beramberî xeteriyek mezin hiştine. Dewleta Tirk a dagirker, aliyê stratejîk ve, hewl dide Misaqa Millî pêk bîne û herdû bakurên Sûriyê û Îraqê dagir bike. Ango dixwaze ji rewşa kaos ya li herêmê rû daye sûdê werbigire û Herêma Bakur û Rojhilatî Sûriyê û herdû parêzgehên Heleb û Idlibê heya Herêma Kurdistana başûr û herdû bajarên Mûsil û Kerkûkê îlhaqî xwe bike.

Dewlet dagirker a Tirkiyê difikire bi têkbirina hêzên têkoşîna azadî û demokrasiyê re dê desthilatdarî û dewleta xwe ya faşîst biparêze. Wê yekê jî di bicihkirina sînorên Mîsaqa Millî de pêkan dibîne ku wê çaxê dê biryarên Şam, Bexda û welatên herêmê xesib bike û dê bixe bin kontrola xwe.

Êdî ev xeyal û azweriyên faşîzma Tirk çendîn pêkan e li ser erdê pratîze bibin, cihê nirxandin û mijara gomanek mezin e! Texmîn dike bi piştgiriya komên cîhadîst, terorîstên DAIŞ, Al Nusra, Al Qayîde û hinek xayînên fena binemaliyê Barzanî û bi hêza NATO`yê re wê karibe îradeya gelan derb bike û gelê Kurd ê resen qir bike. Lew re jî berê xwe daye vê rêbaza homojen a netew dewlet – olperest ku zihniyeta xwe ya faşîst a nijadperest û otorîter bi zorê ferz bike. Ancax nêzîkatiyek wisa ku biratî, hevkarî, cudahî û parvekirinê qebûl nake, bi têkoşîneke havpar a demokrasî û azadiyê ya gelan têk biçe. Rastiya ser erdê jî dibêje; êdî ti şansekî faşîzmê nemaye ku gelekî hêjayî jiyanê ye ji nû ve têk bibe û xaka wî desteser bike. Berxwedana ku îro bi pêşengiya Gerîlayên Kurdistanê têye raberkirin, misogeriya jiyana pirrengî, azadî û demokrasiyê ye.